

# QENGE YEKITIYE

KOVARA YEKITIYA DEMOKRATÊN KURDISTAN

Rêxistina Qenciya Gelemer ya Pejirandî

-----  
Zeitschrift der Union der Demokraten Kurdistans  
-----  
Gemeinnütziger Verein e.V.  
-----



NEWROZA WE PÎROZ BE!  
2597 - 1985

-----  
Ji BO Serxwebûnê Di Eniyek Niştimanî de Bighên Hev!  
-----

Sal: 3/1985

Hêjmar: 5/6

Biha: 5,-DM

Hezar, hezar sed sal herin

Merd û namerd ser bigerin

Te bernadin em ji destan

Welatê me xweş Kurdistan

T Ê D A Y Î

<u>N i v î s a r</u>	<u>N i v î s k a r</u>	<u>Rûpel</u>
"Jîn" bersîvek.....	Hemreş Reşo	1
Rêzannameya Koma Doliwger a YDK.....	.....	6
Biryarên Komcivîna V. ya YDK .....	.....	14
Axaftina Newrozê.....	Hemreş Reşo	17
Ho Şivan .....	Osman Sabrî	22
Bir çok özelliği..		
Yılmaz Güney .....	İhsan Aksoy	25
Di wêjeya... ..	X.Rıza	32
Der bekannte kur- dische Dichter CEGERXWÎN .....	Hemreş Reşo	33
Yılmaz Güney .....	Abidin Sönmez	35
Parçerojnameyên elmanî ku li ser Kurd hatine nivisîn.....	.....	44

---

Navnîşan..... YDK (UDK)  
Anschrift..... P.F. 103041  
4650 Gelsenkirchen

---

- 1) Postgiro-Konto-Nr.:810-439, Postgiroamt Essen, PLZ 36010043
  - 2) Commerzbank, Filiale Gelsenkirchen, Neumarkt 3, PLT 42040040  
Konto-Nr.: 4306262.
-

"J Î N"  
BERSÎVEK DÎROKÎ YE

Hevalê hêja M.E.Bozarslan dîsa bi derxistin û lêhûrnêrîneke bê hempa deng da! Em havila xebata Wî diyariya Newrozê dipejirînin.. Ev diyariya pîroz kovara "Jîn"e. Nemaze lêhûrnêrîna Wî,bi serê xwe,hêjayî belavkirinê-ye. Di vê pêşgotinê de çaviya şînek (kudret kaynağı) nû di kûrayî û tariya dîrokê de hatiye berçavkirin... Navandina vê pêşgotinê bi "pêşkeşî" gelekî rast e û di ciyê xwe de ye. Jiber ku bi "pêşkeşkirinê" merov dikare mêjiyên bi ramanan dagirtî, ku bûna ûşta tengdîtin û korayiyê, bide vejandin û ciyê wan ji totik (aqil) re berde...

Gava merov "lêhûrnêrînên dîrokî û civakî",destûr û rêzannameyên (raporên siyasî) sazî û rêxistinên kurdistanî dixwûne, bi gengazî tête dîtin ku rêzaniya wan îro li ser bingehê lixwenenana (înkariya) bûyerên dîrokî û ramanên derkurdistanî hatine avakirin. Her tevgerê an jî şoreşeke Kurd bi berjewendiya (menfeet) xwekesî (sexsî) an jî bi ya çînparêzî ve girêdidin. Hebûna ramana welatparêziyê, hebûna welatparêzan ji bîra dibin, wan bi burjuwaziya netewî ve girêdidin, waha lê dîkin ku ka bi xwe "ji ezmanan,bi zembîlan hatine xarê" û berî wan kesekî an jî rêxistinekê xebat û têkoşîna azadî û serxwebûnê nekirine. Her bi xwe tenê li ser reya rast in û yê derî wan hemû xwefiroş,noker û xwepereştin! Nayête bîra wan ku hebûn û mayîna gelê Kurd spasda-

rê cangoriyên (şehîdên) pêşeng û şoreşgerên Kurdistanê-  
nin. Nikarin rastiya berçav bibînin ku bi sedan netewe  
(millet) li ser van hêrem û navçeyên Rojhelata Navîn ha-  
tine pişavtin, helandin û wendakirin û navên wan bi tenê  
di nav rûpelên dîroka kevnar de dikare were dîtin! Ger  
îro navê gelê Kurd, navê welatê me Kurdistan û zimanê  
kurdî hebûna xwe parastîye, dîsa ev havila tevger û ber-  
xwedanên gelê Kurd ên dîrokî ne. Gelê Kurd li ser vê re-  
ya han bi sedhezaran gorî daye. Hebûna me, vejandin û geş-  
bûna tevgerên kurdistanî hemû bi xwûna wan hatiye avdan  
û jîndar maye..

Çawa ku "ji tunebûnê hebûn û ji hebûnê jî tunebûn nabe",  
her waha bê xebat û berxwedana gelê Kurd a dîrokî jî ge-  
lê Kurd îro wek neteweyekî li ser rûyê gêtiyê (dinê) ne-  
dima û êdî navê wî jî nedihate bilêvkirin!

Em ne di wê bîrûbaweriyê de ne ku divê em bê lêhûrnêrîne-  
ke zanistî û rexneyên avadar hemû tevger û têkoşînên dî-  
rokî ji xwe re bikin rêber û li ser biçin. Bi vacayî (bî-  
lakîs) divê em bi serûbin, bi kûrayî û gelekî zîz (hesas)  
li dîroka tevgerên kurdistanî binêrin, lêkolîn û lêhûrnê-  
rînine zanistî bikin, da ku bikaribin bingehê xebata xwe  
li ser serpêhatiyên hîndar (dersdar) avabikin. Divê em  
her serpêhatiyêke bi havil û bêrdar ji xwe re bikin mal û  
jê xwedî derkevin û yê çewt jî dûrî xwe bidin. Em dijî  
nankorî, nandozî û çavtengiya ramanparêziyê dengê xwe bi-  
lind dikin.

Di vê derbarê de lêhûrnêrîna heval M.E.Bozarslan bersîve-  
ke dîrokî ye! :

Nivîskar dibêje "em careka dî jî bêjin ku amanc û daxwaza me ji nivîsîna van rexneyên jorîn ên ku me li ser sîyaseta pêşewayên Kurd, xasma li ser sîyaseta Komela Pêşketina Kurdistanê nivîsîn, ne ev e ku em xebata wan neçê binumînin, yan leke bînin ser xatira wan, yan jî rûmet û qedrê wan nizim bikin û xatira wan li ber çavê Kurd reş bikin. (.....) Ew, xebatkarên Kurdistanê, yê gewre bûne, şopa azadîxwazî û rizgarîxwazîya gelê Kurd di sedala XX. da bi xebata xwe vekirine, doza gelê Kurd birine civîn û konferansên navberneteweyî û bi cîhanê dane zanîn. Paşê, çend kes ji wan di rîya azadîya neteweyê Kurd da gan dane, bûne şehîdên me yê ezîz. Ên ku ji kab filitîne jî li derê welêt derbider bûne, li xerîbîyê di rewşên zor û giran da jîyana xwe domandine, heta hilma wan a paşîn jî kovan û evîna Kurdistanê di dilê wan da bûye. Xatira wan hemîyan li bal me ezîz û bilind e. Em li pêşberê xatira wan serê xwe bi rêzdarî ditewînin. (.....) Divê ku mirov ji xebat û têkoşîna şehîdan jî, ji qusûr û kemayîyên wan jî ders û tecrube histîne, di pêşdemê da careke dî meydan nede qusûr û kêmayîyên wisa."

Belê ev bersîveke dîrokî ye û kovara "Jîn" jî ji van hîndariyan dagirtî ye!

Jiber ku rêxistinên firo bi çavtengî (hesûdî) bi ramanên xwe digrin û diparêzin, dikarin bi gengazî bibin goriyê tengdîtin û korayiyê. Ewana di bin her tevger û xebatekê de amanca berjewendiyêke diravî (maddî menfeet) dibînin û ligor wê jî lêkolîn û lêhûrnêrinên xwe didin ber xwe!..Gava hîmê lêgerîn û lêkolînekê li ser çewtiyê were avakirin, dê tegez (muheqeq) dongiya (netice) wê jî çewt be.

Rast e ku gelê Kurd jî wek hemû gelan di her gavavêti-  
neke (qonax) civakî (sosyal) re derbas bûye û dê derbas  
bibe jî. Eva qonaxine xwezayî (tebîî) û dîrokî ne. Kesek  
nikare vê hêrikîna dîrokî rawestîne. Lê xwebêja (maneya)  
vê ne ew e ku armanca yekemîn dê hêrgiz (illa) berjewen-  
diya diravî ye. Berjewendiya diravî di hemû tevgeran de  
veşartîye û dongiya wan jî gîhana hebûneke diravî ye. He-  
bûna gelê Kurd jî hebûneke diravî ye. Lê di cengîn û şo-  
reşên dijmetingehî û dijmetinkarî de armanca yekemîn aza-  
dî û serxwebûn e. Serbilindî, serfirazî û parastina rûme-  
ta merovî ye! Di vir de berjewendiya gel ji hemû berje-  
wendiyên kesan an jî çînan giranbihatir tête zanîn û na-  
sîn. Di van ceng û şoreşan de hezkirina gel, doz û daxwa-  
za azadî û serxwebûnê destekî pola dilîzin. Ev hezkirina  
gel, doz û daxwaziya serxwebûnê mercên (şertên) ramana  
welatparêziyê nin!.. Di ramana welatparêzî û tevgerên  
welatparêziyê de ciyê jihev cudakirina çînen gel tune ye.  
Ciyê berjewendiya kesan an jî çînan tune ye. Bi tenê ber-  
jewendiya gelemper ya giştî, berjewendiya gel tête ber-  
çavan. Di ramana welatparêziyê de bi tenê tawanbariyek  
berçav (objektîv) heye. Ew jî hevalbendî û destbirakiya  
mêtinkar û neyaran e. Ev kes an jî komikana bi xwefiroşî  
an bi "çaş"itî tên navandin ku ciyê wan di nav gel de na-  
mîne û dibe dijminê gelê xwe..

Wek xweş tête zanîn, piraniya nivîsar, pirtûk û "lêhûrnêrî-  
nên zanistî" li ser gelê Kurd, gellekî mixabin ku bi des-  
tên biyaniyan (xerîw) hatine nivîsîn. Nemaze yên ku bi  
destên peyayên zordar û mêtinkarên me hatine nivîsîn, te-

nê bi armanca wendakirina gelê Kurd û berçavkirina tune-  
bûna neteweyekî bi navê Kurd hatine çapkirin û belavki-  
rin! Yên mayî jî bi armanca navnokirin (bi xirabî zanîn-  
dan) an jî parçekirina gelê Kurd hatine nivisîn. Nema-  
ze yê dawîn gellekî bive û metirsînin (xeter, talûke).  
Jiber ku ewana ji bo gîhana armancên xwe ramanên nûjen  
an jî zanistî bikar dihênin û gellek kesan dikarin bi-  
xapînin, li rê derxin û bikin dezgehên (alet) armancên  
xwe yê gelkuj!

Ma gelo ne bêbextî û çewtî ye ku em jî bi "lêhûrnêrinên"  
xwe ji biyaniyan re malzeme amade bikin, dihol û defa  
wan lêbidin û di aliyê din ve jî gelê xwe ji dîrokeke  
bingehîn bêpar bihêlin?! Ev gelê Kurd û nifşên (gene-  
ratsiyon) pêşende dê tevger û xebatên xwe li ser kîjan  
hîm û bingehan avabikin?!

Belê, divê her têkoşerekî Kurd kovara "Jîn" bixwîne û  
ji jêderên wê destkewtî bibe, ji xwe re bike mal û hîn-  
dariyên ku tê de veşartîne bide ber çavan..

Hemreş Reşo

---

RÊZANNAMEYA KOMA DOLİWGER JÎ BO KOMCÎVÎNA PÊN-  
CEMÎN A YEKÎTIYA DEMOKRATÊN KURDISTAN 8/9.1984

Mêvanên birêz,  
Hevalên hêja!

Bi navê Koma Navînde û Koma Doliwger ya Yekitiya Demokratên Kurdistan bi dilgermî û biratî xêrhatina we dikim. Nemaze hatina nêwerên komelên kurdistanî û mêvanan em gelekî serbilind kirin. Em xêrhatina wan ducarînin û spasên xwe pêşkeşî wan dikin.

Heval û hogirên delal,  
Di dema firo de, di dawiya sedsalên 20.de ajotin û sazkirina cengên azadî û serxwebûnê, rijandina xwûna gelan, sermezariya gelên serdest e, rûreşiya hêzên karbidest û zordest in!

Dîsa rûreşiyek bê hempa ye ku firo li aliyekî bi mîlyonan merov di tariya nezaniyê de dimînin, bi mîlyonan merov firo li ser rûyê cîhanê, li ber çavên merovan birçî û tazî dimînin û dimirin! Li aliyê din gelên dewlemend, ku li ser piştê me bûne dewlemend, ji bo paraztina bihayê bazarên xwe xwarin û vexwarina zêde, bi zaneyî davêjin, dirijînin û helak dikin!

Dîsa hovberî û weşeteke gelekî mezin e ku karbidestên gelên serdest ji bo çavtirsandina hev û din, an jî bindestkirina gelan mîlyaran ji bo çekên nûjen û atomî dirijînin. Herwekî bi çekên



di dest de dikarin gētiyê (dinê) 120 caran kambax bikin! Ma gelo serûbinkirina dinê ya carekê têr nake? Ma kî yê li ser rûyê erdê bimîne ku bikaribe 119 carên din dinê xira bike??

Bi navê kîjan bîrûbawerî an jî di bin ala kîjan ramanê de dibe bila bibe, ev kirin û tevgerana hovitî ye, weşset e, mêrkujî ye, mêtinkarî ye û durrî rûçikên merovî ye.

Dîroka sedsalên bîstan, herçend ku ji serketinên gelên bindest hatiye dagirtin jî, ew bi xwûna gelan hatiye nivisîn. Ev dîroka dê bi destên nifşên (generation) pêşeroj careke din were nivisîn. Çawa ku bûyerên (hedîseyên, olay) Elmanyaya Hîtlerî, Îspanyaya Frankoyî, Portekîza Salazarî û h.d. bûne şermezarî û sernizmiya nifşên îro, dê di rojên pêşende de bûyerên îro jî bibin rûreşî û sernizmiya nifşên sedsalên bîstûyekan!

Em berdî Emerîkaya Bakur û başur ku mêtinkarî, sistemkarî û rengparêzî hespên xwe dibezîne..

Em berdî Efrîkeya Nîvro (başur) ku ta niha jî rengparêzî, bi gotinek din, parêziya merovên spî têtê kirin..

Em berdî Rohelata dûr ku gelên serbixwe hevûdin dixwun.. Me nevê wek "ronakbîrên" Tirk, Faris û Ereb, ji bo veşartina hovberiyên ber çavan dengê xwe dijî yên dûr bilind bikin.

Ji bo naskirina rewşa cîhanî bûyerên li Rohelata

Navîn û nêzîk têr dîkin û bêtir in jî. Rewşa gelê Kurd û gelê Flîstînî bi tenê dikare wehşeta rêzaniya hêzên mezin û biçûk bide ber çavan û zelal bike:

Ev bûn 61 sal ku karbidestên Tirkîyê gelê Kurd dipelçiqînin û dikujin!

Ev bûn 23 sal ku Pêşmergeyên Kurd cenga germ û çekdarî dijî sîtemkarî û zordestiya karbidestên Iraqê dom dîkin!

Ev bûn nêzîkî çar salan ku karbidestên Îran û Iraq Pêşmergeyên Kurd ji bo serketin û berjewendiya xwe bikardihênin,

Û ev bûn heşt sal in ku karbidestên Suriyê pêşengên sazî û rêxistinên Kurd,ên herçarperçe Kurdistan ligor daxwaz û berjewendiya xwe ciwar dîkin û didin xebitandin!

Li hember van bûyerên dirinde û hov hemu gelên li ser rûyê vê gêtiyê kerr û lal dimînin. Nemaze bêdengiya dijberên (opozisyon) van karbidestan,ên ku xwe şoreşger, demokrat, ronakbîr û pêşverû didin naskirin nakeve serên merov, merov nikare têbigêhe çawa evan dikarin çav û devên xwe bigrin! Ma gelo ev ne rûreşî ye ku li hemû Tirkîyê bi tenê yek kes radibe, bi mêranî,bi renekî zanistî dengê xwe dijî zordestên Tirkîyê bilind dike?

Belê, gelekî mixabin ku bi tenê Dr.İsmail Beşikçi dikarê bê tirs,bi baweriyeke polayî mafê gelê Kurd

û hebûna wî di bin hovberiyek dijar de, binivîse,  
bibêje û dengê xwe bilind bike. Rojek ji rojan dê  
Dr. İsmail Beşikçi bibe nîşana aşitiyê di navbera  
gelê Kurd û Tirk de. Ewê bibe serfiraziya nifşên  
gelê Tirk ê pêşende..

Her bijî kek İsmail Beşikçi!

Mêvanên birêz!

Brayên têkoşer!

Hebûna mafê çarenûsa gelan nikare bi mercan (şer-  
tan) ve bête girêdan, ew mafê ku bi mercan ve bê-  
te girêdan, ne maf e, pêwestî ye, erk e, serdanîn e!  
Ta roja îro ne partiyên ku xwe demokrat didin nas-  
kirin, ne partiyên ku xwe olperest dizanin, ne par-  
tiyên ku xwe şoreşger û sosyalîst dibînin û ne jî  
partiyên komonîst li rojhelata navîn karîn xwe ji  
bend û zencîrên riçperestiyê (nîjadperestî) rizgar  
bikin.

Herçend ku niha piştî hewcedariya hêza gelê Kurd  
û qelsiya xwe hin partiyên çeprezan çêla (qala) he-  
bûna mafê çarenûsa gelê Kurd dikin jî, wî mafî bi  
hin mercan ve girêdidin. Bi merca yekitiya hêza  
gelê Kurd û çîna kargerên gelên xwe girê didin!

Bi merca serketina çeprezanîyê ve girê didin!

Yekitiya rêxistin û partiyên Kurd, xebata yekitiya  
gelê Kurd ya gelemperî, ango ya herçar parçan dijî  
xwe dibînin û tucaran napejirînin! Ma gelo ev nas  
kirina hebûna mafê çarenûsa gelê Kurd e? Ma kînga

dikare biryara parçeyek ji gelekî wek biryara hemû gel bête naskirin? Ev partiyên ku şoreşger dibînin, bi van mercan dibin destbirakê emperyalîst û mêtinkaran. Jiber ku ewana bi danîna van mercan sînorên (tixuban) ku emperyalîst û zorkeran di nav Kurdistan de kişandine, welat û gelê me kirin çar parçan dipejirînin û nasdikin!

Birayên hêja!

Hîmê ramanên merovparêz (hûmanîst) gişt ji bona geşî, xweşî û serfiraziya merovan hatine avêtin. Lê gava ev raman û bîrûbaweriyana bi rastî neyêne bikaranîn, dibin derew û zimandirêjî, dibin fêlbazî, dibin ûştta zordarî û mêtinkariyê.

Ramanên olperestiyê (dîndarî) hevbirên xwe, ango hev-olên xwe bira dizanin, kuştin û pelçiqandina wan qedexe ye. Wekhevî destçura wan e! Ma gelo yên ku Kurdistan di nav xwe de parve kirine ne îslam in? Xomeynî îro gelê Kurd bi navê kê didê kuştinê û Kemalîstan di destpêkê de di bin kîjan navî de karîn gelê Kurd bikin hevalbendên xwe?

Ramanên demokrasiyê de azadiya merovan merceke bingehîn e, lê Kurdistan bi destên emperyalîstên wê demê Înglîz û Firensizan, ên ku welatên xwe wargeha demokrasiyê dinasîn, bi hevalbendîya Kemalîstan hate parçe kirin.

Di ramana şewrewî de hebûna mafê çarenûsa gelan bê merc û şirut tête naskirin. Lenîn li ser sosyalîzm û hebûna mafê çarenûsî dibêje: "Divê em di destûra

partiya xwe de rizgariya gelên bindest bixwazin û ji bo standina mafê çarenûsa wan bixebitin, ger şansê serketina gelên bindest ji hezarî yek be jî destxistina mafê çarenûsa wan û çêkirina dewleta wan mafekî mutlaq e."

Ne Wilson di 14 deqên xwe de û ne jî Lenîn di nivîsarên xwe de hebûna mafên çarenûsî bi mercan ve girêdabûn. Lê gelekî mixabin ku hevrêzanên wan îro vê tawanbariyê (suc,guneh) dikin.

Mêvanên birêz,  
hevalên dilsoz!

Gelê Kurd divê xwe bi gotinên vala nexapîne, hemû gelên ku îro serdest in, bi xwe biryara xwe dan, bi xwe cenga serxwabûnê saz kirin û hemû çînên gel di şerê serxwebûnê de beşdar bûn û xwûna xwe rijandin.

Em îro temaşeyî cenga çekdariya Kurd li Kurdistana Rohelat û Navîn dikin. Wana bi salan doza Ewtonomiyê dane ber xwe. Jiber ku bi vê doz û daxwazê sînor ji xwe re danîne, ango sînorên ku bi destên emperyalîstan hatine kişandin pejirandine, ketine têkoşîna paraztina berjewendî û serketina perçeyên xwe. Ev dûzanek xwaza ye, ango qanûnek tebî'î ye ku heryek ji wan dê bibe hevkar û dostê zordarê yê din. Dê bêgav (mecbur) bibin dijî hevûdin jî bicengîn û bibin ûşta birakujî. Ev dûzana xwaza ye ku îro PDK-Îran bûye hevalbendê Seddamê xwûnmij û PDK-Îraq jî bûye hevalbendê Xomeyniyê keleş!

Ma gelo,gava Pêşmergeyên Kurdistan bi yekdest ala serxwebûnê hildana, rê hebû ku evana hevûdin bicengin, an jî bikaribin bibin lîstok û hevalbendên zorkerên Kurdistan?

Em dibînin ev du car in ku xortên PKK êriş dibin ser peyayên tirkan û dibin ûştta ku karbidestên Tirk ên hov û dirinde êriş bibin ser gelê Kurd û ser de jî têkevin nav parçe Kurdistana Nîvro! Ma gelo ger saziyên Kurdistana Bakur bikaribûna bibin yek û destê. xwe jî bidana Pêşmergeyên Rohelat û Nîvro cenga serxwebûnê saz bikirana, dê leşkerê Tirk bikaribûya evende çavsorî,kuştin û êriş bikirana? Na, nedikarîn û îro gelên cîhanê yên azadîxwaz jî nedikarîn li hember vê weşetê bêdeng bimana.

Mêvanên birêz,  
heval û hogirên giranbiha!

Îro hîm û bingeha rêzaniya karbidestên gel û welatan li ser berjewendiyê tête ajotin û meşandin.Gava çîk ji gelan ranebin,ewana bi xwe hefsar û lîwana tevgera serxwebûnê nexin destên xwe,hêz û hebûna xwe xwe nedin ber çavan,tucaran nikarin dost û hevaline rasteqîn peyda bikin.Gava tu tuneyîbî çawa dê hevaltî çê bibe? hevaltî du alî ye,yek bi serê xwe tenê nikare hevaliyê peyda bike. Hewcedar û alîkar kînga dikarin bibin heval û bûne heval? Divê yekekî din jî hebe ku vê hevaliyê bixwaze! Bi tenê divê em lihevhatina Cezayîr ku di navbera

Saddam û Şahê Îran de, di sala 1975 de, pêkhat bi-  
din ber çavan. Me dît ku hemû hêzên mezin dilxweşi-  
ya xwe pêşkeş kirin. Ew hevhatin biryara kuştina  
gelê Kurd bû..

Îro gava ku em şerê di navbera Îran û Iraq didin  
ber çavan, em dîsan dibînin ku berjewendiya wela-  
tan di piştgîriya Iraq de dibê yek. Alîkariya Iraqê  
bi destên welatên Rohelat û Rojava têtê kirin!  
Divê êdî em biş têbighên ku kesek jiber çavreşiya  
me alîkarî û hevaliya me nakin. Divê em baş bizanin  
ku kesek jiber ku em xwedîmaf in, lê têne êşandin  
û kuştin, alîkariya me nakin. Divê em nebin xeyalpe-  
rest, rastî çi ye, em jî nasbikin û ligor van ras-  
tiyana reya serxwebûna gelê xwe bidin ber çavên xwe.  
Divê hîmê stratejiyek têkuz û jî bo demek dûr û di-  
rêj bête avêtin. Nabe ku em her stratejiya xwe bi-  
kin taktîk û taktîka xwe jî bikin stratejî!..

Serxwebûn û azadiya gelê Kurd bi tenê dikare li ser  
bingeha welatparêzî û yekitiya gel were saz kirin û  
ajotin!...

Her bijî Pêşmergeyên Kurdistan!

Her bijî merca hebûna mafê çarenûsa gelan!

Bimre mêtinkarî, zordarî û emperyalîzm!

Pirr Spas

KOMCIVÎNA PÊNCAN A YEKÎTIYA DEMOKRATÊN KURDISTAN, BI rawestîna bîstekê ji bo Cangoriyên Kurdistan, di 8.09. 1984 de li Düsseldorf destpêkir û piştî berhevdanên du rojan belavkirina van biryarên jêrin hatin pejirandin:

Komcivîn,

- 1-a) bi xurtî dengê xwe dijî mêtinkarî û zordariya li ser gelê Kurd ku bi destên Karbidestiya Tirkiyê li Kurdistana-Bakur tête kirin bilind dike. Vê Karbidestiyê lîstok û dîvîka leşkerê nijadperest dinase.
- b) bi hişkî dengê xwe dijî tevgera leşkerî ya Karbidestiya Tirkiyê bilind dike ku bi navê "qirkirina terorîzmê" û di bin ala "anîna bêdengî û xweşiyê" de gelê Kurd dipelçiqînê, bi belavkirina çekan di nav gelê Kurd de dixwazê gelê me be hev bidê kuştin û êriş dibê ser Kurdistana-Nîvro. hêvî û hawar ji gelê Kurd dike ku nebin lîstoka çavsoran û ûştê birakujiyê!

Komcivîn,

- 2-a) bi tundî dengê xwe dijî hovberî û pelçiqandina li ser gelê Kurd ku bi destên Karbidestiya Komara Îslamî tête kirin bilind dike.
- b) bi dilgermî piştgîriya Pêşmergeyên Kurdistan-Rojhelat dike, Şoreşa wan parçeyek ji cenga serxwebûna gelê Kurd dizane.



Komcivîn,

3- a) bi dil û giyan piştgîriya Pêşmergêyên Kurdistana-Nîvro dike, Şoreşa 23 salî parçeyek ji cenga ser-Kurdistanî dizane.

b) Eniya C U D ya dijî nîrê Beesî serketina gelên li Iraqê dinase.

Komcivîn,

4- -) bi xurtî ji Karbidestiya Suriyê doz dike ku bi dayîna mafên gelê Kurd ên çand û netewî, bi vegerandina hemwelatîyê û linavrakirina "Kembera Erebi" doliwgeriyeke wekhevî li Suriyê pêk bîne.

Komcivîn,

5- a) dengê xwe dijî dijberiya di navbera berpirsiyarên Şoreşa Kurdistana-Rohelat û Kurdistana-Navîn de bilind dike û doza pêkanîna Eniyek Niştimanî, di bin ala Serxwebûna Kurdistan de, pêşniyar dike.

b) herçend ku rewşa gelê me û rêxistinên wî li Kurdistan-Bakur ji bo tevgereke çekdarî bêrdar nabîne jî, dijminiya tevgerê bi eşkerayî jî rast nabîne. bi xurtî doz li rêxistinên Kurdistanî dike ku bi van dijberiyên xwe nebin hevalbend û lîstoka Karbidestiyaya Tirkîyê!

Komcivîn,

6- -) bi xurtî û tundî dengê xwe dijî lihevhatina Karbidestiyên Tirkîyê û Iraqê bilind dike ku bi hevkarî dixwazin Şoreşa Kurd vimirînin û gelkujîyê bikarbihênin.

Komcivîn,

7- -) bi xurtî dengê xwe dijî alîkariya leşkerî-aborî ku bi destên welatên Rohelat û Rojava ji Karbidestiya Tirkiyê re tête kirin bilind dike û dide xuyanîkirin ku bi van alîkariyana ewna jî di gelkujî, helandin û pelçiqandina gelê Kurd de dibin hevpar.

Komcivîn,

8- -) doz li rêxistinên navnetewî, wek UNO, û yên merovparêz û aşitîxwaz dike ku şoreşa gelê Kurd a 23 salî, Şoreşa standina mafê şarenûsa gelê Kurd binase û nêwerên wê bi mîrî bange civînên xwe bikin.

---

Frankfurt, roja 30.03.1985

C E J N A N E W R O Z

Mêvanên birêz, Welatparêz û Şoreşgerên hêja!

Heval û Hogirên dilsoz!

Cejna we pîroz be!

Bi navê Kurd-Kom û bi navê Yekitiya Demokratên Kurdistan, bi dilgermî xêrhatina we dikim. Em bi beşdarbûn û hatina we gellekî serbilind, serfiraz û dilxweş bûn. We Newroza gelê Kurd şên û geş kir.

Em hêvîdar in ku Cejna Newroz a îsal ê bikaribe bibe ûş-ta linavrakirina sarî, jihevduî û rikdariya ku ketiye navbera rêxistinên gelê Kurd û ciyê wan nexweşiyên gelkuj biratî, nermî, germî û hevnezfikî bigre!

Wek tête dîtin, îro Kurd-Kom, ku ji KKDK û Mala Gelê Kurd pêkhatiye, û Yekitiya Demokratên Kurdistan dikarine Cejna Newroz bi tevkari û yekdest hev re pîroz bikin! Em bawer in ku ev rastiya berçav dê we gişan dilxweş bike û em bi xwe jî jiber vê yekê gellekî serfiraz û serbilind in!

Em li vir didin xuyanîkirin ku emê di niha de destên biratî, bi dilgermî dirêjî hemû rêxistinên kurdistanî bikin ku em gişt tev bikaribin Newroza sala 1986 an saz bikin û li-darxin. Ev Newroza navrêxistinî dê hêza gelê Kurd, yekitiya welatparêz û şoreşgerên Kurd bide ber çavan. Ev e doz û daxwaza gelê me û ev e ya bikaribe çavên zordar û mêtinkaran bişkênîne!

Xûçk û Birayên delal!

Di dîroka Kurdistan de, bi tunekî gelemperî ta niha tevger

û têkoşînek wek îro nehatiye dîtin. Hişyarî û xwenasî (bi-  
linç) tucaran mîna îro, bi regekî nûjen di nav gelê Kurd  
de cîwar û belav nebûye.

Em îro dibînin ku li her aliyê Kurdistanê lihevketinek çik-  
dar, têkoşîn û keftelefteke jîndar û şoreşeke niştimanî di  
bin ala azadî, wekhevî û serxwebûnê de domdar e. Di nav ge-  
lê Kurd de têkoşîna rêzanî, di girtîgeh û zîndanên mêtinkar-  
ran de keftelefte berxwedan û li ser çiyayên Kurdistanê jî  
şoreşa germ û çekdar dijî nîrên çavsor û olperestiya kev-  
nare tête ajotin. Giyanê welatparêzî û şoreşgeriyê her roj  
bêtir teye vejandin, gur û şênkirin!

Jiber van bûyerên berçav in ku îro karbidestên Tirkiyê no-  
kerî, zordestî, riçperestî û mêtinkariya xwe wek caran ve-  
naşêrin. Hewl didin ku gelê Kurd linav rakin, wenda bikin  
û gelên li Tirkiyê têxin bin nîrekî hov û dirinde û wan çav-  
tirsî Likin û bipelçiqînin! Îro li Tirkiyê, bi gelemperî û  
li Kurdistana-Bakur bi taybetî ne dîzan (qanûn) û ne jî na-  
vê demokrasiyê maye. Faşîstên çavsor û har ligor daxwaza di-  
lên xwe lîwana doliwgeriya (idare) welêt xistine destên xwe  
yên qirêj. Ew destên zordar û qirêj dê teqez rojekê werin  
şikandin!!..

Mêvanên birêz!

Xûçk û birayên hêja!

Çawa ku meseloka Newrozê de tête gotin, berî 2597 salan ge-  
lê Kurd tev gelên hevîjad, di Rojhelata-Navîn de, di bin nî-  
rê zînatkariya Dahak de dinalî, li hawêrdorên welêt şîn û  
reşgirêdan bû bû jiyana rojane, îro jî di nav gelên Rojhe-  
lata-Navîn de, di nav gelên Tirk, Ereb û Faris de bi giştî

û di nav gelê Kurd de bi taybetî dîsa şînkirin û reşgirê-  
dan bûye jiyane rojane. Kurdistan bûye Mêtîngeh! Kuştin,  
xwûnrêjan bi destên faşîstên riçperest (nîjadperest) bûye  
para gelê Kurd! Êdî dîsa "kêr hatiye li hestiyên rawestayê".  
Çawa ku Kawayê hesinkar û dilşewat êdî nikarî xwe bigre,  
bervanoka xwe kir Al û hilda û horsê di dest de, bi qîr û  
hawar kete nav şeqem û kolanan, tev şênîyê bajêr, bi yekdes-  
tî êriş birin ser Dahakê xwûrmêj û serê wî pelçiqandin, dê  
hêrgiz Pêşmergêyên Kurdistan jî bi hevkarîya gelên cîran û  
aşitîxwazên cîhanê, serê mêtinkar û zordaran bişkênînin û  
bighên azadî û serxwebûna xwe. Di dîrokê de serdestiya zor-  
dar û mêtinkaran tucaran domdar nebûye, dê her karbidestiya  
wan helweşe û bibe rûpeleke reş di kevniyê dîroka rêzanî  
û civakî de!..

Ka Şahê ku xwe "Aryamêr" navandibû? Ka Mistefa Kemalê ku  
xwe bavê Tirkan navkiribû? Ka Salazar û Franko h.d. an jî  
ka ew Hîtlerê ku xwe cîhangîr dida nasîn?..

Berî 2597 salan jî yekîtî û yekdestî tunebû, kesî nedikarî  
xwe bida pêş û bibe pêşengê gelempêr. Mîna ku hûn jî di-  
zanin reya têkoşîna serxwebûna gelên bindest ji gellek ke-  
lem, cangorî û dijwariyan digirtî ye, nemaze ya gelê Kurd  
di Rojhelata-Navîn de!.. Ji bo vekirina reya han gellek  
west, keftelê, vîndarî û tewat pêwîst e. Ciyê pîrsa qelsî  
û kêmîrxemiyên di ferhengê xebata serxwebûna gelan de tu-  
neye! Gelên bindest divê hêrgiz hêza xwe bi neyaran bidin  
zanîn û naskirin. Bê guman û bê şik çavika vê hêzê jî hiş-  
yarî, xwenasî û xebata yekdestî ye. Bi tenê keşên hişyar û

xwenas dikarin dijî neyarên hevpar destên xwe bidin hev  
û bighên doz û armancên xwe! Bi tenê kesên hişyar û xwe-  
nas dikarin dev ji berjewendiyên xwekesî(şexsî),dev ji  
pîvanên bi çûk berdin! Mafxwaz, xwedîmaf hemû hevrê ne!  
Mafxwaz û xwedîmaf hemû heval in! Wek şoregerê hêja Os-  
man Sebrî dibêje:

Ger zilmê hene top û tîfing,keştî û leşker  
Têk de dişîne ser xwedîmaf pê re dike şer

Ew tev nikarin destê wî yê pola bibestî  
Zorbaz û sitemkarên keleş tê de diwestî

Her maf wekî ro nayê veşartin bi tebayî  
Bayek tê, dibe ewrên di reş, zû dike sayî!

Herçend ku cudabûn di nav bîr û bawerî, an jî ramanên me  
de hene jî û divê hêrgiz hebin jî. Bi tenê li ser reya li-  
hember hev rabûna raman û bîrûbaweriyên merov dikare pêş-  
ve biçê û reyeke rast ji bo xebata serxwebûna gel peyda bi-  
ke. Lê herçend cudabûn hebe jî, em dîsa ji ên derveyî xwe  
bêtir nêzîkî hev in. Belê dixwazim vê gotinê bicarînim: Em  
ji kesên derveyî gelê xwe, ji kesên biyanî, bêtir nêzîkî  
hev in! Me YEK welat, me YEK dîrok, me YEK çand heye! Doz  
û daxwaza me jî YEK e! Me hemûyan SERXWEBÛNA KURDISTAN di-  
vê!

Belê,ristikên kevnare di nav gelê me de, kedxurî,mêtinkar-  
rî û şêlandina zordar û mêtinkaran li Kurdistan li ber ça-  
van e û her kesekî Kurd van nasdike û seh dike. Ligor bîr  
û bawerîya me, bi tenê li ser reya hişyarkirina gel em di-  
karin ristikên kevnare û paşverûyiyê li nav rakin. Em dîsa

bawer in ku bi çandina tova xwenasiyê di nav gel de û  
bi pêkanîna, çêkirina Eniyek Niştimanî an jî Eniyek Nete-  
wî emê bikaribin li hember neyarên renga reng cenga ser-  
xwebûnê saz bikin û bajon.

Em dîsa bawer in ku gelê Kurd bi tenê serê xwe, ji gelên  
cîran û gelên azadîxwaz qutbûyî nikare bigêhe armancên  
xwe. Em hêrgiz hewceyê dostanî û alîkariya gelên cîran  
û aşitîxwazên cîhan in. Ev gişt dîsa di reya yekdestî û  
xwenasiya gelê me re desrbas dibe.

Çawa ku îro Dahakê hendemîn Emperyalîst û marên Dahak jî  
Kolonyalîst in, her waha Kawa yê hendemîn jî Eniya Nişti-  
manî, yekitî û Yekbûn e!

Gellekî sipas.....

Henreş Reşo

---

## HO ŞIVAN (1)

Ho Şivan, şivanê Kurd, Kurdê şivan!  
Li pêş te ez dibînim dozek giran.  
Dozeke bi ser û ber, bê dest û pê,  
Li pêş me hatin dadan dergeh û rê.  
Serê me bû berîka kesên neyar,  
Çi xwestin ew xistinê hemî xisar.  
Di warê serxwebûnê me nebû kam,  
Holê em nizim ketin bûne xulam.  
Pirrîrî duhezar sal em bindest in,  
Hercarê me tiliya xwe digestin.  
Nexurand bi destê xwe me pišta xwe,  
Di warên xelkê dikir me gešta xwe.  
Warê dibû kolî ji bo biyan,  
Li ser me hikim dikir xwedî raman.  
Niştinan wa xopan bû, gel tê bindest,  
Bi destên xêrnexwazên kevneperest.  
Ezmanê Kurdistanê reş û tarî,  
Bi ser da sitemek xurt her dibarî.  
Gel tê da bindest maye şewîşîye,  
Wek colê serberdayî bê xwedî ye.  
Neyarên me ne yek in, sisê û çar,  
Dirêjî me dikin ew wek gurên har.  
Her rojê kuştin, mirin, nefî, zîndan,  
Şêst sal in pêda ev e halê Kurdan.  
Peyayên qenc û sere têne kuştin,  
Kesê jê arudû bê qet nehiştin.  
Bi destên neyaran tên vegijgijîn,



Bêtaŵ man nema zanin çawan bijîn.  
Dirrevin belav dibin di cîhanê,  
Nizanim bo kê dêhlin Kurdistanê?  
Niştiman parçe bûye, çar kerî ne,  
Kesên tê kal û ciwan tev serî ne.  
Serî ne, bê dest û pê, bê ronahî,  
Ji lewra di welêt da nema şahî.  
Xortên me ji kalên xwe ne çêtirin,  
Zana ne ji nezanan bêkêrtirin.  
Naxwazin bi zanîna xwe aza bin,  
Dixwazin wek tê xwestin ew pê rabin.  
Berên wan ketiye hev bi neyarî,  
Şerpeze westiyane di vî warî.  
Ma kînga bi yekdestî ew dê rabin?  
Bi xebat û ramana xwe aza bin.  
Pirrên wan wekî axan difikirin,  
Di reya xelkê da ew her dimirin.  
Herwekî Xwedê dane ku xulam bin,  
Ji bona gel û welêt ew bê kam bin.  
Naxwazin bi destên xwe ew bèn vejîn,  
Dixwazin di ber destên xelkê bijîn!..

XXXXXXXXXXXXXXXX

Piştî ez bêhêvî bûm ji van kesan,  
Ku welat nayê parastin bi hewesan.  
Vegerîm min berî da we mendalan,  
Bawer im hûn ne wekî xort û kalan.  
Dê ji bo rizgariyê bixebitin,  
Bikarin li pêş neyar bitewitin.

Bi serên xwe biramin ne ên biyan,  
Holê dê bikaribin hemî Kûrdan,  
Li Iraq û Îranê, li nav Turkan,  
Vejînin yekdest bikin wekî burkan,  
Biteqin di çar cihan wek hîdrojîn  
Biheje di bin we da rûyê zemîn.  
Çarmedor neyaran tev birrevînin,  
Rêzanek pêşverû di welêt dînin.  
Xilas bin ji bin destên van zorbazan,  
Welatê xwe paqijkin ji tolazan.  
Serbilind aza bijîn di niştiman,  
Wê hîngê serxwe dibin di Kurdistan.

Osman Sebrî

1 -Kargehan 983

(1) Şivan, lawê xortekî hêja ji Kurdistana  
Bakur ku niha li Şamê dimîne ye.

---

BİR ÇOK ÖZELLİĞİ BİR ARADA TOPLAYAN YARATICI  
bir insan!.... Y I L M A Z      G Ü N E Y...

Türkiye'de toplumsal gelişim süreci içinde düşün, sanat ve eylem alanlarında zaman zamanda olsa varlığını duyuran insanlar yetişiyor.

Bunlardan bir tanesi ve önde gelenlerinden biride hiç kuşkusuz Yılmaz Güney'dir.

Yılmaz Güney konusu, Türkiye'de daha uzun yıllar ve çeşitli nedenlerle tartışma konusu olabilecektir. Bu tartışmaların odak noktasını belkide genellikle siyasal görüş ve etkinliklerini oluşturacaktır. Ne varki Yılmaz Güney'i bu yönüyle ele almak, onun etkinliğini, sanatsal yaşamını, yaratıcılığını küçük bir çerçeveye sıkıştırarak onu haps etmek demektir.

Bu denli güçlü, yaratıcı ve milyonlarca insana seslenme becerisini göstermiş bir insana böylesi bir yaklaşım haksızlık olacağı gibi sağlam bir temelede dayalı olamaz.

Yılmaz Güney, her şeyden önce bir sanatkar, bir yazar, bir yapımcı, davranışlarıyla başkaldırı tiplerinin simgesi durumunda olan bir oyuncu, her kesimden milyonlarca insana hitap eden ve geleceği işçi ve emekçi insanların aydınlık ufuklarında arayan, her fırsatta bu mesajı iletmeye çalışan güçlü bir gözlemcidir. Bu gelişimini kendi eti, tırnağı, savaşıyla adım adım elde ederek geldiği yere gelmeside yaşamına daha değişik anlam kazandırıyor. Ama onun devrimci önermeleri, Türkiye ve dünya hakkındaki görüşleri ayrı bir durumdur. Yani diyelimki onun siyasal görüşlerini benimseneyen bir insan hemencecik bir kalem-

de onun sanatsal deęerini yokmu saymalıdır? Hem öyle yapsa ne olacak? Yada onun siyasal düşüncelerini, önermelerini benimsemeyen biri onun sanatsal kişiliğini, etkinliklerini görürse onun siyasal görüşlerinedemi katılmış oluyor? Kanımızca bu son derece kısır ve dar bir yaklaşım olur. Bu bakımdan böylesi kısır bir tartışmayı bir yana bırakarak konumuz olan "yaratıcı ve etkin" bir insanın sanatsal kişiliğine kısaca dokunmak daha yararlı olacaktır..

Yaşamı Güçlüklerle Dolu Korkusuz Bir İnsan:

Yoksul bir Kürt ailesinin çocuęu olarak yaşama gözlerini açan Güney daha üniversite öğreniminin ilk yıllarında toplumsal dengesizliğin, sömürü-baskı ve ezginin farkına varmakta gecikmedi. Toplumsal farklılıklara, baskı ve ezgiye olan tepkisini yazıyla dile getirdiğinde olgun bir gençlik dönemi yaşıyordu. Bu yazıların bir roman olarak ortaya çıkması Yılmaz Güney'in cezalandırılmasına yetiyor. Ama bu cezalar bir yandanda onun dahada bilinçlenip, gelişimini sağlamasında dürtücü öğelerinden biri olmakta gecikmiyor..

Bu, yürekli insanı bundan sonra sinema dünyasında görüyoruz. Gangesterliğin kol gezdiği ve en bayağı kokuşmuşluğun var olduğu bir çevrede yeredebilmek, onun düzenine ayak uydurmak, onunla birlikte yürümek, onu onaylamakla olanaklıydı. Bunun karşıtı, o çevreden uzaklaşmakla özdeşti. Ama herkesinde bildiği gibi Güney bunu yapmadı, onların bataklığına batmadan, ama orda kirlenmeden, tutunmanın gerekliliğine inanarak kaldı. Kendi dediği gibi kameramanlık-

tan, figüranlığa, üçüncü, dördüncü derecedeki rollere kadar her yerde yer aldı. Sahne gereçlerini, kameraları taşıdı.. Ama eğilmeden ve gangesterlik girdabına batmadan sağlam adımlar atmaya başladı. Eğilmeyen bir başın ve yürekli bir kişiliğin hızla etkinlik sağlamaya ve kendisini kabul ettirmeye başladığını görüyoruz bundan sonra...

**Bir Çok Özelliği Kişiliğinde Birleştiren Adam:**

Güney sinema dünyasında ismini doyurup, kendisini kabul ettirmeye başlamasıyla birlikte Türk sinemacılığı yeni bir alt üst oluş döneminde başlangıcına girmiş oldu. Yıllar yılı kitleleri uyuşturmanın ve vurgunlar vurmanın en etkin aracı olarak kullanılan sinema Güney'le birlikte kitlelerin dili ve gölgesi olmaya başlıyordu. Sömürü ve ezgi mekanizması çeşitli yönleriyle ve ustaca işlenerek ortaya konuyor, kitlelere başkaldırının mesajları verilme-ye çalışılıyor, aydın ve özgür geleceğe varmanın savaşım ile olanaklı olacağı anlatılıyordu.

Bu toplumsal farklılıklar, sömürü ve ezgi perdeye aktarılırken gözlemler çok ciddi ve çarpıcı olarak öne çıkıyor ve halkın kişiliği somutlanıyordu.

Elbette Güney daha çok tarım kesimindeki çelişkileri ve kent küçük burjuvazisinin yaşamını konu edinmiştir. Bunda ilk önce Güney'in ilk gençlik yıllarında yetiştiği çevre olan Çukurova'nın ve ailesinin geldiği Urfa'nın etkisi olsa gerekir. Özellikle Urfa ve Çukurova toplumsal dengesizliklerin kucak kucağa buluştuğu birer değişik yerdirler. Çukurova ve özellikle Adana bir yandan sanayi kuruluşlarıyla dolarak, diğer yandan pamuk ve narenciye "ağaları"

feodal ve kapitalizm karışımı etkinliklerini ve varlıklarını sürdürüyorlar. Yoksulluk ve savurganca tüketicilik yana yana yürüyor. Apartmanlar ve barakalar yanyana yayılıyor. Baskı ve zulüm ile yaşam kavgası birlikte,at başı gidiyor.. Pre-Kapitalist yapılarda kendisini gösteren külhanbeylik, kabadaylık ve lumpenliğin her çeşidi Adana'da çok ilginç görünümümlerle kendisini duyuruyor. İklim koşulları ve iş alanlarının varlığı Adana'ya özellikle Kürdistan'dan onbinlerce insanı getirmiştir. Her sınıf ve tabakadan Kürd'ü Adana'da bulmak olanaklıdır. PAKTAŞ gibi Çukurovanın en modern (Türkiye'nin de) tekstil sanayii kuruluşunun başı Kürtlerden oluşuyor. Yine irili ufaklı binlerce para babası Kürt kökenlidir. Ama her sabah iş pazarında iş arayanların çoğunluğuda Kürt'tür. Boyacıların,hamalların çoğunluğuda Kürt. Kürt'ler aralarındaki kan davasını ve ailesel çatışkılarını burdada sürdürüyorlar. Bunun yanı sıra ırgatlığın tam anlamıyla var olduğu yerde burasıdır. Eli kamçılı kahyalar şimdi bile yer yer varlığını duyuruyor.. Üstelik çeltik ve pamuk tarlalarındaki ve portakal bahçelerindeki en son model makinaların varlığına inat.. İşte böylesi bir toplumda yetiştirme çağını geçiren,böylesi olaylarla haşır neşir olarak yaşam yolunda adım atan bir insanın topluma bakışı kuşkusuz belli etkilenmeler içinde olacaktır. Kaldığı bu etkiler hangi yazarın,çizerin,sanatçının üstünde yokturki...Etkili toplumun diğer ucu Urfa'ya dayanıyor.. Toplumsal gelişmelerin alabildiğine sivrildiği bir toplum kesimi.. Bir yandan aşiret kavgalarını onlarca can aldığı en acımasız girdabı,diğer yandan onlarca köye hükmeden toprak beyleri,bürokrasi ve yöne-

timle kol kola aşiret şefleri,diğer yandan yüzbinlerce yok-  
sul,topraksız,her türlü insanca yaşama olanağından yoksun,  
baskı ve zulmün katmerlisini yaşayan bilinçsiz,yığınlar,yı-  
ğınlar. Urfa ve Çukurova'nın parabalaları birbirlerini sefa-  
hat yerlerinde görüyor,oralarda dostluklarda kuruyorlar.İşte  
böylesi bir karmaşanın,böylesi girift bir toplumsal yapının  
içinde oluşmuştur Güney. Birikiminin,toplumsal farklılıklara  
bakışının ilk imajlarını bu yapıdan almıştır. Ama onu sentez-  
lemiş,iyice yoğurarak sonuca bağlamış ve her defasında top-  
lumunu bir yönüyle yansıtmı becerisini göstermiştir.  
Güney'in filimlerinde toplumun çok geniş kesiminden insanlar  
kendi yaşamlarını yansıtılmış olarak görürler. Onun için bü-  
yük bir kesim onun filimlerini buruk bir ilgiyle izliyor..  
Güney'de işçi sınıfı savaşıyla ilgili tarihsel gelişim ken-  
disini daha net olarak göstermiyor. Bunda elbette işçi sını-  
fı savaşıunun ulaştığı noktada rol oynuyor. Ama tümüyle ele  
alındığında Yılmaz Güney'in sanatı açık bir biçimde ezilen,  
baskı gören ve sömürülen sınıf ve tabakaların yaşamını işli-  
yor,onu konu alıyor...

Güney'in filimleri çoğu kez birer çığlık gibi sarsıyor izle-  
yeni.Toplumsal çelişkilere çözüm ve önermeler bir çok zaman  
yanıtsız birer soru olarak yer alıyor. Ama toplumsal çelişki,  
kukuşmuşluk,yıkıntı,baskı,ezgi,sömürü tüm açıklığıyla ve çe-  
şitli yönleriyle yansıtılarak,bu toplumsal düzenin deđiştiri-  
lmesi,bunun içinde savaşım verilmesi gerektiđi mesajı ken-  
disini her zaman gösteriyor. Konuların kahramanları hep sö-  
mürülenler,hep baskı görenlerdir. Türkiye'de acımasız toplum-

sal dengesizliğin sömürü ve baskının altında inletilen emekçi sınıf ve tabakaların yalın,doğrudan ve anlaşılır birer anlatımıdır. Güney'in filimleri. Bir yandan sömürülen insanların çeşitli kesimlerinin yaşamı konu edilirken,diğer yandan burjuvazinin kokuşmuş,çürümüş yaşamıda konu edilmeye başlanmıştı.. Hapishane yaşamı Yılmaz Güney'in filimleriyle Türkiye ve dünyaya en yalın biçimiyle kendisini duyurmuştur. Türk sinamacılığında Yılmaz Güney ile birlikte Kürt ulusunun varlığı perdede tüm katılığıyla kendisini göstermeye başlamıştır.

Güney'in filimlerinde izleyici çoğu zaman tedirgin bir hava içinde kendisini kaptırır. Tedirgindir,çünkü yansıtılan ortam,toplumsal dilimlerin yaşamları tedirgin ve ürkütücüdür... Bu filimleri A sından Z sine kadar Güney'in bizzat katkısı, yaratıcılığıyla vücut buldular. Elbette onda rol alan,teknik yönlerinde çalışan yetenekli unsurların katkısı olmuştur ama filimler,senaryosu ile,rejisi ile ve yapımı ile Güney'in eserleridir.

Böylesi çok yönlü,yaratıcı ve yetkin bir sanatkara başka bir örnek daha göstermek çok zordur.Bu açıdan sürükleyici etkin,yaratıcı bir büyük sanatkardır Yılmaz Güney..

Dünya ilerici sanat hareketi önemli bir mensubunu,Kürt halkı değerli bir evladını,Türkiye ilerici-demokrat kesim önemli bir insanı kayb etti...

Bu kısa yazı Güney'in eserlerinden,sanatından bahs etmekle birlikte böylesi bir konu ancak bu konularda söz söyleme hakkına sahip yetkin kalemlerin işidir. Biz burada yalnızca ölümü dolayısıyla bir iki noktaya özlüce dokunmayı gerekli



gördük.

